

HELBESTKAREKÎ TEKYAYA HEZANÊ: MELA EHMEDÊ HEZANÎ

M. Zana KARAK

KURTE

Mela Ehmedê Hezanî heta niha nehatiye naskirin û derbarê wî de agahiyên zêde jî tune ye. Alimekî ku di heyama dawî ya Dewleta Osmanî û nivê ewil ê serdema Komara Tirkîyeyê de jîyaye. Mela Ehmed li Gulpîka Hizana Bidlîsê hatiye dunyayê û li Hezana Licê medfûn e, lêbelê tarîxa çêbûn û wefata wî nayê zanîn. Navê bavê wî Mela Zubeyr e û ew jî birayê Şêx Ebdulqadirê Hezanî ye. Di helbestên Mela Ehmed de tê dîtin ku jî Şêx Mihemed Selîmê Hezanî pir hezkiriye û li ser wî medhiye nivîsîne. Ev yek jî nîşan dide ku ew jî bi terîqeta Neqşebendîya Xalidîyê ve girêdayî ye û murîdê Şêx Mihemed Selîmê Hezanî ye. Îhtîmaleke mezin ew jî weke şairên ji devera Hezanê li ba alimên meşhûr ên mîna Şêx Mihemed Selîm û bavê wî Şêx Ebdulqadirê Hezanî perwerdeya tesewîfî wergirtiye. Li gorî agahiyên heyî 5 helbestên wî gihaştine roja me û mecmûeyeke ku wî bi xetê xwe îstînsax kiriye heye. Di helbestên xwe yê Kurdîya Kurmancî de mexlesa “Hemdi” bi kar anîye. Heta niha ev helbest di lîteratûrê de cî negirtine û helbestnûsiya Mela Ehmed jî nehatiye zanîn. Di vê xebatê de dê li ser van helbestên wî ku heta niha nehatiye weşandin bê rawestan. Bi vî awayî dê helbestên wî jî aliyê ruxsarî û naverokî ve bî nîrxandin û ligel destxetan metna transkîrîbekirî bê pêşkêşkirin. Bi vê lêkolînê dê aliyê wî yê edebî û tesewîfî derkeve holê.

Peyvên Sereke: Mela Ehmedê Hezanî, Neqşebendî, Tekyaya Hezanê, Şêx Mihemed Selîmê Hezanî

M. Zana KARAK,

Lêkolêrê Serbixwe, m.zana47@gmail.com,
Orcid: 0000-0003-1681-4917.

Article Type/Makale Türü:

Research Article/Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 31.08.2023

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 26.09.2023

Published / Makale Yayın Tarihi: 30.09.2023

DOI: 10.35859/jms.2023.1353484

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:

Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atıf:

Karak, M.Z. (2023). Helbestkarekî Tekyaya Hezanê: Mela Ehmedê Hezanî, The Journal of Mesopotamian Studies, 8 (2), ss. 171-201, DOI: 10.35859/jms.2023.1353484.

Hezan Tekkesi'nin Bir Şairi: Hezanlı Molla Ahmed

ÖZ

Hezanlı Molla Ahmed şimdiye kadar tanınmamış olup hakkındaki mevcut bilgiler de azdır. Osmanlı Devleti'nin son dönemleri ile Türkiye Cumhuriyeti'nin ilk yarısında yaşamış bir alimdir. Doğum ve ölüm tarihleri tam olarak bilinmeyen Molla Ehmed, Bitlis'in Süttaş köyünde dünyaya gelmiş ve Liceye bağlı Savat'ta (Hezan) da gömülmüştür. Molla Ahmed'in Babası Mela Zübeyr, Hezanlı Şeyh Abdülkadir'in kardeşidir. Molla Ahmed şiirlerinde Hezanlı Şeyh Muhammed Selim'e olan sevgisini dile getirmiş ve ona medhiyeler yazmıştır. Bu da aynı zamanda onun Nakşibendi-Halidi tarikatına bağlı olduğunu ve Hezanlı Şeyh Muhammed Selim'in müridi olduğunu göstermektedir. Büyük ihtimalle Hezan bölgesinin şairleri gibi o da Şeyh Muhammed Selim ve onun babası Şeyh Abdülkadir gibi ünlü âlimlerden tasavvuf eğitimini almıştır. Elimizdeki bilgilere göre 5 şiiri günümüze ulaşmış olup, güzel hattıyla istinsah ettiği bir mecmuası da bulunmaktadır. Kürtçenin Kürmanca lehçesiyle yazılmış olan şiirlerinde "Hemdi" mahlasını kullanmıştır. Şu ana kadar bu şiirleri literatüre girmemiş ve Molla Ahmed'in şairlik yönü de bilinmemekteydi. Bu çalışmada onun bugüne kadar yayınlanmamış şiirleri üzerinde durulacaktır. Bu çalışmada şiirleri şekil ve içerik açısından değerlendirilip şiirlerin transkripsiyonlu metni ile birlikte elyazmaları da verilecektir. Bu araştırma sayesinde onun edebi ve tasavvufi yönü de ortaya çıkacaktır.

Anahtar Kelimeler: Hezanlı Molla Ahmed, Nakşibendî, Hezan Tekkesî, Hezanlı Şeyh Muhammed Selim

A Poet of Hezan Lodge: Mela Ehmedê Hezanî

ABSTRACT

Mela Ehmedê Hezanî has not been known until now and there is very little information available about him. He is estimated that he lived in the last periods of the Ottoman Empire and the first half of the Republic of Turkey. Mella Ehmed was born in Bitlis Gulpik village and was buried in Hezan, which is connected to Lice, and her birth and death dates are unknown. His father, Mela Zubeyr, is the brother of Şêx Ebdulqadir Hezanî. In her poems, Mela Ehmed expressed her love for Şêx Mihemmed Selimê Hezanî and wrote eulogy poems on him. This also shows that he was affiliated with the Khalidi Naqshbandi sect and was a follower of Şêx Mihemmed Selimê Hezanî. Like the poets of the Hezani region, he probably received Sufi education from famous scholars such as Şêx Mihemmed Selim and his father Şêx Ebdulqadirê Hezanî. According to the information we have, 5 of his poems have survived and he has a magazine that he copied with beautiful handwriting. He used the pseudonym "Hemdi" in his poems written in the Kurmanca dialect of Kurdish. These poems have not been included in the literature until now, and Mela Ehmed's poetic direction was not known. This study will focus on her unpublished poems. In this study, her poems will be evaluated in terms of form and content, and the transcribed text through this research, his literary and mystical side will be revealed.

Keywords: Mela Ehmedê Hezanî, Naqshbandi, Hezan Lodge, Şêx Mihemmed Selimê Hezanî

Extended Abstract

In classical Kurdish literature, schools of Qadiri and Naqshbandi sects take an important and extensive place. After the end of the Kurdish principalities, there was a great political and social vacuum in the Kurdish regions. Over time, these gaps were filled by the sects. In particular, the Qadiri and Naqshbandi sects played a major role in filling this gap. Thanks to these above-mentioned sects, there have also been many developments and developments among the Kurds in the field of Kurdish

literature. Many scholars, sheikhs, mullahs, and poets emerged through the tribes and wrote religious, religious, and literary works under the roof of madrassas and individuals. Forms such as eulogies, odes, quadrates, mesnawis, pentastiches, constitutive verses and so on have been liked and written among the madrasa people.

Many scholars and poets have also emerged around madrassas and the Hazan Lodge, and this lodge has played a major role as a centre in the development of religious, sufi and literary sciences. Thanks to the murids and caliphs of this centre, dozens of scholars have qualified and science have spread throughout the region. Especially during the Khalidiya stage, a literary movement emerged, and during this period many poems were written for sheikhs and murshids in various forms of marsiyeh and madhiyyah. In these poems, sheikhs and murshids have mostly emerged and these people have been seen as mashuq. Mullah Ahmad Hazani is also one of the poets who had been educated under the roof of the madrasa, becoming a mullah and a scholar. It is understood from his poems that he was also a follower of the Khalidi Naqshbandi tradition.

Mullah Ahmad Hazani's family moved from Muş to Diyarbakir Lice and settled in there. We do not have clear and definitive information about his birth and death. However, Mullah Ahmad Hazani lived at the end of the Ottoman State and in the first half of the Republic of Turkey and was buried in the family cemetery in Lice. Many scholars and poets have outgrew from the family of Mullah Ahmed. His uncle Sheikh Abdulqadir Hazani, his cousin Sheikh Mohammed Salim Hazani, and his nephew Sheikh Ismetullah Karazi have become both scholars and sheikhs in the same area. They also had literary aspects and wrote poems. Mullah Ahmed studied by Sheikh Abdulqadir Hazani and Sheikh Salim Hazani and took advantage of their knowledge. Mullah Ahmed, like his uncle and cousin, also lived with literature in addition to his scientific side and wrote poems of praise for his cousin Sheikh Salim Hazani.

Mullah Ahmed has not yet been recognized as a poet in the field of literature and his poems have not emerged. According to the available information, five of his poems have reached our day and there is a memoir that he wrote in 1908. Mullah Ahmed used the name "Hamdi" in his poems as a source. These poems of Mullah Ahmed were written in the form of a citadel and a quadrate. In his poems, his religious and literary side is ahead. His poems have been written in various forms of marsiyeh and mediha. In the content of his poems, there is mourning for Sheikh Mohammed Ziaeddin Norshini and his love for Sheikh Mohammed Salim Hazani

Mullah Ahmed's language of poetry is somewhat heavy according to his time, and in all five of his poems, there are vocabulary and idioms from Arabic and Persian languages. In his poems, we also see the title of a name that strengthens the poem by the elements of the celebration. With the art of impression, or through a name, the melody of his poems has been strengthened. In order to strengthen the power of narration of his poems, Mullah Ahmed has developed literary arts such as talmih, exaggeration, isti'are, diagnosis, restitution, talmih, nida, alienation, tenasub, istifham and so on in his poems.

Mullah Ahmed is also a member of Khalidi lodges and similarly, his poems fall into the context of the works of lodge literature. These poems that are now in the literature will also be important data for classical Kurdish literature. In this work, his poems will be evaluated by the author and the content, and the text will be shared with the translated text. With this work, another Khalidi poet will be known.

Destpêk

Bi keşfkirina berhem û materyalên nû qada edebîyata Kurdî ketiye nav geşedanê û berfirehtir dibe. Ev materyalên nû derfeta xebat û tesbîtên nû ji lêkoleran re derdixe holê. Her ku diçe di qada edebîyata Kurdî de hejmara şair û berheman bi keşf û tesbîtên nû zêdetir dibe. Mela Ehmedê Hezanî jî yek ji wan kesayetên edebî ye ku heta niha nehatiye naskirin û helbestnûsiya wî jî nehatiye nirxandin.

Mela Ehmed di serdema dawî ya Dewleta Osmanî û nivê pêşî yê Komara Tirkîyeyê de jîyana xwe borandiye û ev yek jî rastî heyama Xalidîyê tê. Piştî serdema mîrektîyên Kurd, Neqşebendîya Xalidîyê jî rengê xwe daye edebîyata Kurdî, di edebîyata Kurdî de bizavek ava kiriye û ev bizav temsîliyeta serdemekê dike. Ji helbestên Mela Ehmedê Hezanî tê fehmkirin ku ew jî yek ji murîdên şêxên terîqeta Neqşebendîya Xalidîyê ye û ihtîmaleke mezin jî şêxê wî Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (w. 1936) ye ku ew jî xelîfeyê Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî (w. 1924) ye.¹

Şêx Ebdilqadirê Hezanî (w. 1908) û kurê wî Şêx Mihemed Selîm Hezanî bi salan li Hezana Licê bi ilm û îrfanê re bilîyane û postnişîniya Tekyaya Hezanê kirine. Ji malbata Mela Ehmed, Şêx Ebdilqadirê Hezanî û zavayê wî Mela Huseynê Resûlanî ji bo îrşadê di salên 1880-1890î de ji Resûlana Mûşê hatine li nehiyaya Hezana Licê bi cî bûne (Aslan, 2011: 159). Di nav çavkanîyan de ku me ji tekyaya Şêx Îsmetullahê Karazî bi dest xistine îfadeya ku vê agahîyê piştrast dike weha ye; “Rûmî 1303: Hatina Şêx Ebdilqadir ya derdora Hezan-Hezro û Liceyê 1887 e” (Karak, 2020: 31).

Dergeha Hezanê ku ji alîyê Şêx Ebdilqadirê Hezanî û malbata wî ve hatiye avakirin di eslê xwe de Tekyaya Norşînê temsîl dike (Çakır, 2017:353-358) û li ser Nehriyê tê hesibandin. Em dikarin vê dergehê weke şaxeke tekyaya Norşînê jî bihesibînin. Lewra Şêx Ebdilqadir bi daxwaz û talîmata murşîdê xwe Şêx Ebdurrehmanê Taxî (w.1886/1887) ve ji devera Mûşê tevî malbata xwe di çaryeka dawî ya sedsala 19em de hatiye li Hezana Licê bi cî bûye û li vê herêmê xebatên ‘ilmî û îrşadî domandiye². Şêx Ebdilqadir li devera Licê medrese û tekyaya ava kirine û tîkîliyên xwe ji tekyayên Norşîn, Çoqreş, Zoqeyd û Oxînê nebiriye û bi wan re tîkîliya xwe dewam kiriye.

Şêx Ebdilqadir di xebatên xwe yên ‘ilmî û tesewîfî de tesîreke mezin li herêmê kiriye û di roja me de jî ev tesîr xuya dibe. Li derdora medrese û Tekyaya Hezanê gelek alim û helbestkar derketine û ev navend di pêşketina ilmên dînî, tesewîfî û edebî de roleke mezin bi cî anîye. Bi saya murîd û xelîfeyên wî yên weke Mela Ehmedê Xasî (w.1951), Mela Mihemed Hadîyê Licî (w.1912), Şêx Mistefa Feyzîyê Sîsî (w.1914) û bi dehan alimên dinê ve ilm û îrfan li herêmê belav bûye. Li medrese û Tekyaya Hezanê heta 1960an jî xizmet hatiye dayîn û piştî vê tarîxê êdî li wir perwerde rawestiyaye (Karak, 2020: 18).

Mela Ehmed ji ber ku hem pismamê Şêx Mihemed Selîmê Hezanî ye û hem jî murîdekî vê Tekyaya Hezanê ye li ser postnişînê vê tekyayê Şêx Mihemed Selîmê Hezanî helbestên xwe nivîsîne. Bi vê minasebetê Mela Ehmed jî dibe yek ji mensûbên dergehên Xalidîyê û bi heman awayî helbestên wî jî dikeve çarçoveya berhemên edebîyata tekyayê. Ev helbestên ku niha dikevin lîteraturê dê ji bo edebîyata Kurdî ya klasîk jî bibin daneyên girîng.

Ji bo vê xebatê me bi ferdên malbata Mela Ehmedê Hezanî re hevpeyvîn kirin, destxet û malûmat berhev kirin. Çarçoveya vê xebatê dê bi van 5 helbestên tesbîtkirî sînordar be. Lewra heta niha haya me ji berhem û helbestên wî yên din çênebûne û ger hebin jî hêj derneketine holê. Ev 5 helbest ji arşîva Mela Ehmed Yalar ve hatiye wergirtin û heta niha tenê nusxeyek van helbestan hatiye tesbîtkirin ku ew jî bi destên Mela Ehmed Yalar ve hatiye nivîsîn (Bnr. Pêvek: 1). Ev hemû helbest dê ji alîyê ruxsarî û naverokî ve bê nirxandin.

¹ Ji bo agahiyên zêdetir ên derbarê Şêx Mihemed Selîmê Hezanî û Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî de bnr.: (Karak, 2021; Karak, 2022a).

² Di vê sedsalê de tekyayên Çoqreş û Zoqeydê jî dîsa bi rêya xelîfeyên tekyaya Norşînê (Şêx Îbrahîmê Çoqreşî û Şêx Ebdilqehharê Zoqeydî) hatine avakirin (Karak, 2020: 17).

1. Jîyana Mela Ehmedê Hezanî û Berhemên Wî

Derbarê jîyana Mela Ehmedê Hezanî de zêde agahî di destê me de tune ye. Navê eslî yê helbestkar Mela Ehmed e. Piştî ku Komara Tirkîyeyê hate damezirandin û qanûna paşnavan derket û pêve li malbatê paşnavê “Erkazan” hatiye danîn. Nasnavê “Mela” jî ji ber ku melatî kiriye lê hatiye danîn.

Malbata Mela Ehmed ji aliyê Bidlîs û Mûşê ve hatine devera Licê. Gava Şêx Ebdulqadirê Resûlanî yê Hezanî ji bo irşadê ji Resûlana Mûşê hatiye, kurên birayê xwe Mela Zubeyr jî bi xwe re anîye devera Licê. Mela Zubeyr li devera Gulpîkê wefat kiriye û hemû kurên wî bi apê xwe Şêx Ebdulqadirê Hezanî re hatine li mintiqeya Licê bi cî bûne. hemû kurên Mela Zubeyr li Norşînê feqetî kirine, gava nû hatine devera Licê jî azib bûne û piştî xwendina ilmê li hin gundên Licê melatî kirine (Karak, 2020: 31; Ahmet Yiğit, Hevpeyvîna Taybet: 25.08.2023). Li gor ku gava hatine devera Licê hemû kurên Mela Zubeyr azib bûne û ew koça ji bo devera Licê jî di salên 1880-1890î de bû, mirov dikare bibêje Mela Ehmed jî wê demê ihtîmal e hêj xort be û çêbûna wî di navbera salên 1860-1870î de be.

Mela Ehmed ihtîmaleke mezin pêşî li ba bavê xwe dest bi xwendinê kiriye û tehsîla medreseyê girtiye û paşê li ba apê xwe Şêx Ebdilqadirê Hezanî û pismam û murşîdê xwe Şêx Mihemed Selîmê Hezanî xwendina xwe domandiye. Mela Ehmed îcazeyên xwe yê ilmî û terîqî girtine an negirtine nayê zanîn. Lêbelê li gorî ku weke mela hatiye naskirin û melatî kiriye ihtîmal e ku ev îcaze ji ap û pismamên xwe yê li Hezanê postnişîniya tekyayê kirine wergirtibin. Li gorî Mela Ehmedê kurê Şêx Îsmetullah; li devera Licê Mela Ehmed pêşî li gundê Fisê, paşê li gundê Qetîna Karazê melatî kiriye û li Hezanê jî muderîsî kiriye (Ahmet Yiğit, Hevpeyvîna Taybet: 25.08.2023). Herweha li gorî neviya wî Sultan Erkazanê jî kalê wê Mela Ehmed li gundê Pêçar û Hezanê jî melatî kiriye (Sultan Erkazan, Hevpeyvîna Taybet: 08.06.2023).

Şecere û neseba wî weha tê îzahkirin: Mela Ehmed kurê Mela Zubeyr e, Mela Zubeyr jî kurê Şêx Mela Ebdullahê Hîzanî yê Semerşêxî (w. 1854) ku xelîfeyê Mevlana Xalîdê Şehrezorî ye. Li gor çavkanîyan nesla vê malbatê digihêje Siltan Şexmûsê Zûlî yê Mêrdînî û ji wî jî digihêje heta bi Hz. Omer. Ji ber vê yekê jî vê malbatê re “Omerî” hatiye gotin (Doskî, 2011: 8).

Ji Mela Zubeyrê kurê Mela Ebdullahê Semerşêxî şeş kur çêbûne ew jî ev in: Mela Resûl, Mela Mistefa, Mela Mihemed Baqî, Mela Ahmed, Mela Elî û Mela Huseyn (Arslan, 2013: 12; Bnr. Pêvek: 2). Hemû kurên Mela Zubeyr gava ji aliyê Mûşê hatine herêma Licê azib bûne û li devera Licê zewicîne. Mela Zubeyr neçûye devera Licê, li Gulpîkê gava li ba mala Taxî muderîs bûye wefat kiriye û wê demê malbata wî jî li gundê Resûlanê bûye (Karak, 2020: 31).

Tarîxa wefata Mela Ehmed jî bi zelalî nayê zanîn, lêbelê em wefata birayê wî yê jê mezintir Mela Mihemed Baqî ku tê gotin ew jî xelîfeyê apê xwe Şêx Ebdilqadirê Hezanî bûye dizanin. Wefata Mela Mihemed Baqî 1942 ye û li gor malbatê Mela Ehmed beriya wî wefat kiriye. Herweha ji helbesta wî ya ku li jêr di rêza yekem de hatiye dayîn tê fehmkirin ku Şêx Mihemed Selîm çûye şîna Şêx Ziyaeddînê Norşînî ku wefata wî jî 1924 e. Ev yek jî nîşan dide ku di vê tarîxê de Mela Ehmed hêj li heyatê bûye. Wefata Şêx Mihemed Selîm jî 1936 e û ihtîmaleke mezin a Mela Ehmed jî kêma zêde dê di van salan de be. Bi qenaeta me dê Mela Ehmed di navbera 1936 û 1942yan de wefat kiribe.

Xulase Mela Ehmed di nivê duyem ê sedsala 19em de li Gulpîkê çê bûye. Weke malbata xwe ew jî bi eslê xwe ji Kopa (Bulanîk) Mûşê jî gundê Semerşêx/Semerkendê (Yokuşbaşı) bûye û jî gundê Resûlana Mûşê bi apê xwe Şêx Ebdilqadir re hatine nehiyeya Hezan (Sawat)a Licê û li devera Licêyê bi cî bûne (Karak, 2020: 35). Mela Ehmed li devera Licê bi Dilşah xanimê re zewicîye, kurekî wî bi navê Mela Necmedîn (w. 1975) çêbûye û keçeke bi navê Samîyeyê jî ji jina wî ya din hebûye (Sultan Erkazan, Hevpeyvîna Taybet: 08.06.2023). Herweha di nivê yekem ê sedsala 20em de jî wefat kiriye û gora wî li Hezanê di nav goristana malbatê de ye.

1.1. Berhemên Mela Ehmed

Li gorî destxetên ber dest ku di pêvekên vê xebatê de hatiye dayîn ji bilî 5 helbestên wî û mecmûeyeke wî ku tê de hin helbest û berhemên Erebi civandiye, ti berhemên wî yên din tune ne. Ev mecmûe ne ya wî ye, lêbelê Mela Ehmedê Hezanî ew bi xetên xwe di 1326an (miladî 1908) de îstînsax kiriye (Bnr. Pêvek: 3). Ebatê vê mecmûeyê 13.03 x 21.00 e û tê de hin kitêbên Erebi yên rêzê yên medreseyê hene. Herweha li gorî Mela Ehmed Yalar hin nameyên wî jî hene (Ahmet Yalar, Hevpeyvîna Taybet: 16.07.2023), lêbelê me nameyên wî bi dest nexistin.

Heta niha em rastî ti helbestên wî jî nehatibûn ku li derekê behs jê hatibe kirin an hatibe weşandin. Lêbelê di encama xebatan de em gihaştin hin helbestên wî ku bi xetê Mela Ehmed Yalar ve hatiye nivîsîn û heta niha di literaturê de cî negirtibûn. Li gorî agahiyên li ber destê me wekî din ti helbestên wî neketine literatura Kurdî.

1.1.1. Mexlesa Mela Ehmed

Xisûsiyeteke bingehîn a edebiyata klasîk ew e ku wek kevneşopîyeye edebî helbestkar bi piranî di dawîya helbest û menzûmeyên xwe de ji bilî nav û leqebên xwe yên rasteqîn navekî cuda û xisûsî weke navê xwe yê edebî bi kar tînin û di cîhana edebiyatê de bi vî navî tînin naskirin. Di edebiyata klasîk de ji vî navî re “mexles” tê gotin (Adak, 2019: 61). Helbet helbestkar di helbestên xwe de dikare navê xwe yê rastîn jî weke mexles bi kar bîne. Yek ji wan kesan jî Mela Ehmed e ku ev kevneşopî şopandiye û di helbestên xwe de mexles bi kar anîye.

Mela Ehmed bêjeya “**Hemdî**” ku ew jî dîsa ji navê wî “Ehmed” bi teşeya tesxîrê hatiye bidestxistin, di helbestên xwe de weke mexles bi kar anîye. Lewra navê wî yê rastîn Ehmed e û ev mexles jî ji navê wî hatiye bidestxistin. Mela Ehmed di hemû helbestên xwe de di 5 cîyan de ev mexlesa xwe di bend û malikên di dawîya helbestan de bi cî kiriye, weke nimûne:

12. *Derdimendê bê delîl im / lê tû î her min delîl*
Hemdiyê jar û zelîl im / el meded seyda meded

17. *Hemdî xerîb û qasî ye*
Çendî nehîb û ‘asî ye
Danî li ‘utbê nasî ye
Wek tûle û kelbê derî

Di nav helbestên wî de tenê di cîyekî de em rastî navê “Ehmed” tînin. Ew jî di helbesta di rêza yekem de di malika 23yem de weha derbas dibe:

Meded ke ey mehê Serhed / ji [bo] vî qa ‘ilê Ehmed
Ew e muflîs ew e bêked / ew e naçar û hem miskîn

2. Vekolîna Helbestan

Mela Ehmed ev helbestên xwe bi bend û malikan û bi teşeya qesîde û murebbe‘ê û bi cûreyên medhiye û mersîyeyê nivîsîne. Ji teşeyên nezmê bi kurtasî qesîde û murebbe‘ weha dikare bê îzahkirin.

Qesîde tê wateya tiştê ku hatiye qesdkirin û mebesta ku hatiye pêşkêşkirin. Di qesîdeyê de helbestkar berê xwe dide kesekî û bi meqsedekê helbesta xwe tîne ziman. Ev meqsed jî yan pesnê wî kesî ye yan jî rexne, pîrozbahî, şîna wî kesî û tiştên bi vî rengî ne. Qesîde teşeyeye nezmê ye ku bi yekeya malikê, yekîtiya serwa û kêşê tê nivîsîn (Adak, 2019: 112-113).

Di edebîyatê de ji wê teşeya nezmê re ku her bendeke wê ji çar risteyên hemkêş pêk tê “murebbe”³ tê gotin (Saraç, 2013:111). Bi gotineke din menzûmeyên ku yekeya wan bend e, hemû bendên wan ji çar risteyan pêk tên û ji aliyê helbestkarekî ve bi heman kêş û bi şiklekî pirserwayî hatibin nivîsîn, ew menzûme weke “murebbe” tê binavkirin (Adak, 2019: 371).

Di edebîyata Kurdî de hem helbestkarên serdema mîrektîyan hem jî yên serdema qonaxa Xalîdiyê qesîde, medhîye û mersîye nivîsîne. Li derdora Tekyayên Neqşebendîya Xalîdiyê jî kesên weke Seyda Mela Mihemed Hadîyê Licî, Şêx Ebdilqadirê Hezanî, Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî, Şêx Mihemed Selîmê Hezanî, Şêx Fethullahê Hezroyî, Şêx Îsmetullahê Karazî, Seyda Mela Ehmedê Xasî û bi dehan helbestkarên din medhîye an jî mersîye (şîname) nivîsîne (Karak, 2022b: 151).

Mersîye di edebîyata klasîk a Îslamî de ew helbest in ku piştî mirina kesekî ji bo şîngirtinê tene nivîsîn. Di Kurdî de mersîye dikare wek şîname jî bê binavkirin. Mersîye di edebîyata Îslamî de herî pir bi teşeyên qesîde, tercî' bend, û terkîbbendê ve hatine nivîsîn (Adak, 2019: 143).

Di edebîyata klasîk a Îslamî de helbestên ku mijara wan pesn û sîtayîş e wek “medhîye” tên binavkirin. Di medhîyeyan de bi gelemperî pesnê kesên payebilind tên dayîn ku bi piranî ew kes jî ji desthilatdarên siyasî, burokratên dewletê, kesayetên girîng ên civakê û kesayet û figurên dînî pêk tên (Adak, 2019: 135).

Di edebîyata Kurdî de ji bo mîran medhîye û mersîye hatine nivîsîn. Piştî dawîlêhatina mîrektîyan ew valahî bi terîqetan hatine tijekirin û gelek medhîye û mersîye jî ji bo şêxên terîqetan jî hatine nivîsîn. Dema em li van helbestên Mela Ehmed mêze dikin ev yek di helbestên wî de jî bi zelalî tê dîtîn. Ji ber ku ew jî murîd û peyrewê terîqeta Neqşebendîyê bû vê yekê bandor li ser helbestnivîsîna wî jî kiriye. Mela Ehmed jî helbestên xwe bi cûreya medhîye û mersîye nivîsîne.

2.1. Ji Alfîyê Ruxsarî ve Helbestên Mela Ehmed

Di vê beşê de em ê ji aliyê ruxsarî ve lêkolîna xwe bikin û em ê li ser teşe, kêş, serwabendî û mexlesê bisekinin.

2.1.1. Teşe, Kêş û Serwabendîya Helbestan

Ev helbestên Mela Ehmed bi piranî bi malikan û bi teşeya qesîdeyê hatine nivîsîn. Herweha hemû helbestên wî li ser destxetê jî di şiklê malikan de hatine nivîsîn. Di qesîdeyên wî de hunera tesmîte hatiye bikaranîn û ev tesmît tesmîta nîvçe ye. Li gor Adak gelek şeweyên tesmîta nîvçe hene.

Helbesta yekem bi teşeya qesîdeya musemmeta nîvçe hatiye nivîsîn û ji 27 malikan pêk tê. Di vê helbestê de şemaya serwabendîya wê aa, ba, ca ye.³ Ev qesîde bi tesmîta nîvçe hatiye hûnandin. Herweha di helbestê de du cûre şemayên serwabendîyê hatine bikaranîn û di şemaya serwabendîya wê de şikestin jî hene. Kêşa helbestê Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun e. Serwaya bingehîn “îlun” e. Di vê helbestê de ji bilî şikestinan her risteyek bûye du parçe û di hin malikan de di sê parçeyên ewil de û di hin malikan de jî di parçeyên ewil ên her du risteyan de serwaya navekî pêk hatiye.

Di vê şeweyê de di malikên helbestê de di çarçoveya serwaya navekî de sê parçeyên hemserwa dernakevin holê. Li gor vê şeweyê di hemû malikan de ji bilî serwaya bingehîn a helbestê ku di dawîya risteyan de cî digire, di nîveka her du risteyên malikan de jî serwaya navekî heye. Di vê rewşê de parçeyên duyem ên her risteyan li gor serwaya standart û bingehîn a helbestê ne û parçeyên wan ên yekem di nav xwe de hemserwa ne. Şemaya şeweya navekî ya vê helbestê abab, cdcb, efeb ye (Adak, 2019:564), lêbelê tê de şikestin jî hene û di hin ciyan de şewê diguhere. Weke nimûne sê malikên ewil ên helbesta di rêza yekem de weha ne:

³ Ji bo agahiyên zêdetir ên derbarê musemmet û tesmîtan de bnr.:(Adak, 2019: 544-563).

1. *Xudaya kan xelîlê dil / penah û rehnumayê dîn
Siracê mehfel û menzil / şehê 'alem Ziyaeddîn*
2. *Şehê 'alem mehê xawer sedaya erci 'î bişnîd
Cihan zîr û zeber şod ez firaqê şeh Ziyaeddîn*
3. *Firaq û dehşet û dahî / tenê bo me nebû cana
Sema û erd û tamahî / bi hucreş têk(i) berbad in*

Helbesta duyem jî dîsa bi teşeya qesîdeya musemmet a nîvçe hatiye nivîsîn û ji 11 malikan pêk tê. Şemaya serwabendîya wê jî aa, ba, ca ye. Kêşa vê helbestê Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilun e. Serwaya wê "ana" û paşserwaya wê jî "Selîm" e. Dîsa şewaya şemaya navekî jî weke helbesta yekem abab, cdcb, efeb ye. Weke nimûne her du malikên ewil weha ne:

1. *Kewser û abul-heyat e / cam û fincana Selîm
Melce û fewz û necat e / eywan û dîwana Selîm*
2. *Fatihê qufla qulûban / mexzena esrarê Heq
Serwerê mehbûb û xûban / têk(i) qurbana Selîm*

Helbesta sêyem dîsa bi teşeya qesîdeya musemmet a nîvçe hatiye nivîsîn û ji 12 malikan pêk tê. Şemaya serwabendîya wê jî aa, ba, ca ye. Kêşa helbestê Fa'iatun / Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilun e. Serwabendîya bingehîn di helbestê de tune ye, malik bi rêya paşserwaya "el meded seyda meded" ve bi hev ve hatine girêdan. Ev paşserwaya wê "el meded seyda meded" e ku di dawîya hemû malikan de tê dubarekirin. Serwaya navekî dîsa bi rêya tesmîtan pêk hatiye ku di her malikekê de serwayeke cuda hatiye bikaranîn. Di helbestê de di du parçeyên ewil ên serê her du risteyan de serwaya navekî pêk hatiye. Şeweya şemaya navekî jî weke helbesta yekem e, lêbelê parçeyê çarem di hemû malikan de tê dubarekirin û şemaya wê aBaB, cdcB, efeB ye. Weke nimûne du malikên serê helbestê weha ne:

1. *Dil ji dest çûye Xuda ra / el meded seyda meded
Wer kerem carek bi ma ra / el meded seyda meded*
2. *Ev dilê qasî yû lahî / der cesed bê çare ye
Hey bike b' hubba Îlahî / el meded seyda meded*

Helbesta çarem jî dîsa bi teşeya qesîdeya musemmet a nîvçe hatiye nivîsîn û ji 15 malikan pêk tê. Şemaya serwabendîya wê jî aa, ba, ca ye. Kêşa wê Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun e. Serwabendîya bingehîn di helbestê de tune ye, malik bi rêya paşserwaya "seyda eman seyda eman" ve bi hev ve hatine girêdan. Serwaya vê helbestê jî bi rêya tesmîtan pêk hatiye ku di her malikekê de serwayeke cuda hatiye bikaranîn. Ev serwa jî di parçeyên ewil ên her du risteyên malikê de pêk hatiye. Şewaya şemaya navekî weke helbesta yekem e, lêbelê parçeyê çarem di hemû malikan de hatiye dubarekirin û şemaya wê jî bûye weke helbesta sêyem aBaB, cdcB, efeB ye. Weke nimûne her du malikên serê helbestê weha ne:

1. *Seyda 'ê Sanî Şeh Selîm / seyda eman seyda eman
Qutbê zemanî Şeh Selîm / seyda eman seyda eman*
2. *Hem dilruba û dilberî / ez derdimend im derdimend
Şîrîn-leb û leb-şekkerî / seyda eman seyda eman*

Helbesta pêncem li ser destxetê di şeklê malikan de hatiye nivîsîn. Ev helbest hem bi malikan û di teşeya qesîdeyê de hem jî bi çarîneyan û di teşeya murebbe'ê dikare bê nivîsîn. Lêbelê ji ber ku ev helbest li dora tekyayê hatiye nivîsîn û tê de hunera îadeyê heye weke murebbe'ê bê nîşandan dê maqûltir be. Ev murebbe' jî 17 çarîneyan pêk tê û şemaya serwabendiya wê jî abab, ccbb, dddb, eeeb ye. Kêşa vê helbestê jî Mustef'îlun / Mustef'îlun e. Di helbestê de serwaya bingehîn "rî" ye û tê de paşserwa tune ye. Şêweya vê murebbe'ê di nav şêweyên standart de şêweya "Murebbe'a Muzdewica Digel Benda Yekem a Mutenawib" e.⁴ Weke nimûne du bendên serê helbestê weha ne:

1. *Îro hebîbek min heye
Şehzade ye hem şeh-perî
Hem dil-hebînek min heye
Durdane ye leb-şekkerî*
2. *Leb-xunce ye xweş-xeber e
Dêm kewkeb e qed 'er'er e
Rû-bînce ye xweş dilber e
Ev Şah Selîmê enwerî*

Tablo 1: Hin Taybetiyên Ruksarî yê Helbestên Mela Ehmed.

Helbestkar	Mela Ehmedê Hezanî				
Serdem	Sedsala 19em û 20em				
Herêm	Hezana Licê ya Diyarbekirê				
Helbest	Helbesta 1.	Helbesta 2.	Helbesta 3.	Helbesta 4.	Helbesta 5.
Ziman-Zarava	Kurdîya Kurmancî	Kurdîya Kurmancî	Kurdîya Kurmancî	Kurdîya Kurmancî	Kurdîya Kurmancî
Teşeya Nezmê	Qesîde	Qesîde	Qesîde	Qesîde	Murebbe'
Yekeya Nezmê	Malik	Malik	Malik	Malik	Bend
Hejmara Bend û malikan	27 malik	11 malik	12 malik	15 malik	17 çarîne
Kêş, Qalib û Behra Erûzê	Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun (Behra Hezecê)	Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlun (Behra Remelê)	Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlun (Behra Remelê)	Mustef'îlun / Mustef'îlun / Mustef'îlun / Mustef'îlun (Behra Recezê)	Mustef'îlun / Mustef'îlun (Behra Recezê)
Serwa (Serwabendî)	"în" serwaya murdef e	"ana" serwaya muqeyyed e	Serwaya bingehîn tune ye.	Serwaya bingehîn tune ye.	"rî" serwaya muqeyyed e.
Şemaya Serwayê	aa, ba, ca, ...	aaaa, bbba, ccca, ...	aa, ba, ca, ...	aa, ba, ca, ...	abab, ccbb, dddb, eeeb ...
Paşserwa	Tune ye.	Paşserwaya wê "Selîm" e.	Paşserwaya wê "el meded seyda meded" e.	Paşserwaya wê "seyda eman seyda eman" e.	Tune ye.

⁴ Ji bo agahiyên zêdetir derbarê vê şêweyê de bnr.: (Adak, 2019: 377).

Mexles û Cihê Wê	“Hemdî”, di malika 27em de.	“Hemdî”, di malika 11em de.	“Hemdî”, di malika 12em de.	“Hemdî”, di malika 15em de.	“Hemdî”, di benda 17em de.
------------------	-----------------------------	-----------------------------	-----------------------------	-----------------------------	----------------------------

2.2. Ji Alîyê Naverokê ve Helbestên Mela Ehmed

Di vê beşê de helbestên Mela Ehmed bi kurtasî ji alîyê tema, ziman, uslûb, hunerên edebî û ji alîyê kevneşopî û girîngîya wê ya di edebîyata Kurdî de dê bê nîrxandin.

2.2.1. Mijar û Cûreya Helbestê

Di edebîyata Kurdî ya li dora tekyayên Neqşebendî û Qadirîyê de gelek helbestên şîn û medhê hatine nivîsîn. Murîdên li van navendan ji bo şêx û postnişînên xwe helbest hûnandine û hest û hezkirina xwe ya ji bo wan bi zimanê helbestê anîne ziman. Yek ji wan navendan jî Tekyaya Hezanê ye ku gelek alim û şair jê derketine. Yek ji wan kesên ku li dora tekyayê helbestên bi vî awayî nivîsiye Mela Ehmed e. Di navenda helbestên Mela Ehmed de murşîdê wî Şêx Mihemed Selîmê Hezanî heye ango fokûsa wî Şêx Mihemed Selîm e.

Helbesta yekem qesîde ye û cûreya wê mersîyeye ku li ser Şêx Ziyaeddînê Norşînî hatiye nivîsîn. Weke tê zanîn ew jî şêxê Şêx Mihemed Selîmê Hezanî ye. Di helbestê de em fehm dikin ku murşîdê Şêx Mihemed Selîmê Hezanî wefat kiriye, tazîya wî hatiye danîn û Şêx Mihemed Selîmê Hezanî jî di vê tazîyê de şîna wî girtiye. Helbestkar di dawîya helbestê de jî medhê murşîdê xwe Şêx Mihemed Selîmê Hezanî dike.

Helbesta duyem, sêyem û çarem jî qesîde ne di medh û pesnê Şêx Mihemed Selîmê Hezanî de ne û cûreya wan jî dibe medhîye. Di van helbestan gelek têgehên dînî û tesewîfî jî cî digirin.

Herweha di helbesta pêncem de jî dîsa medhê Şêx Mihemed Selîmê Hezanî heye. Lê ev helbest hem weke malikan hem jî weke bendan dikare bê nivîsîn. Me ew weke bendan û ji bendan jî bi çarîneyan nivîsî, lewra di vê qonaxa Xalidîyê de ev teşeya murebbe‘ê bêtir hatiye tercîhkirin. Di helbesta tekyayê ya vê qonaxê de zimanê helbestê sivik bûye û hêmanên sebkê Iraqî hinekî hatine terikandin. Bi qasî ku tê dîtin di vê qonaxê de murebbe‘ jî wek teşeyeke nezmê belav bûye (Adak, 2019:572).

Ev helbest ji alîyê şeklî ve dibe murebbe‘, lêbelê ji alîyê mijar û cûreya xwe ve ew jî medhîye ye.

2.2.2. Ziman û Uslûba Helbestkarî

Gava em li van helbestên wî dinîhêrin em dibînin ku zimanê wî li gorî serdema ku tê de jiyaye hinekî giran e û bi bêje û terkîbên biyanî hatiye hûnandin. Ji helbestên wî tê fehmkirin ku Mela Ehmed ji bilî zimanê dayîkê Kurdî zimanê Erebbî û Farsî jî zanibûye, lewra ew jî ehlê medreseyê ye û ev ziman di medreseyan de tên hînkirin, ew jî hîn bûye. Tesîra Farsî û Erebbî di helbestên wî de xwe bi zelalî dide der.

Uslûba wî herikbar e û ev unsûrên ahengê yê mîna tesmîtê jî mûsîqîyeye xweş di van helbestên wî de ava kirine. Qelesa helbestkar xurt e û helbestên wî jî ji alîyê edebî ve têr û tije ne. Di helbestan de tê dîtin ku gelek cûre ji hunerên edebî jî hatine bikaranîn.

2.2.3. Ciwankarîya di Helbestan de

Di helbestên Mela Ehmed de gelek unsûrên ahengê û hunerî hene. Helbestkar bi uslûb û hunerên edebî yê weke telmîh, mubalexe, îstî‘are, teşbîh, îade, telmî‘, nîda, alîterasyon, tenasub, îstîfham û

hwd. ve helbestên xwe xemilandiye. Di helbestên wî de jî ciwankariyê gelek cûre hene, jî wan huneran em dê çend nimûneyan li vir binivîsin:

Dem qudsî ye enfasê 'Îs
Ew hey dike qelbê celîs
Ya Reb bikî bo me enîs
Wî der mihad û mehşerî

Di vê benda jor de jî bo mûcîzeyaya Hezretî Îsa ku bi nefesa xwe mirî sax dikirin telmîh heye.

Ji giryan eşk(i) tîn wek Nîl / di her şam [û] seher yaran
Me qibla dil bûye tehwil / 'enakêş [û] esef-xord in

Di vê malika jor de hunera mubalexeyê heye, lewra hêsirên çavan bi rûbarê Nîlê re hatiye şibandin.

Dermade me ey surperî / ez mustemend im mustemend
Dil-xeste me ey dêmzerî / seyda eman seyda eman

Di vê malikê de bi tekrara herfên “d”, “m” û “s”yê ve alîterasyon çêbûye û dîsa bi herfa “e”yê jî asonans derketiye holê.

Di nisbet Behrê Umman bû / di hikmet şubhê Nu'man bû
Der ulfet pîrê Ken'an bû / çû refî Yûsif şod û xemgîn

Di vê malikê de jî di Nu'man û behra Ummanê de şibandin heye ve hunera teşbîhê derketiye holê. Dîsa bi Pîrê Ken'an jî qesta wî Hz. Yeqûb e ku li vir navê wî nehatiye gotin û ev jî dibe hunera îstiareyê.

Îro hebîbek min heye
Şehzade ye hem şeh-perî
Hem dil-hebînek min heye
Durdane ye leb-şekkerî

Leb-xunce ye xweş-xeber e
Dêm kewkeb e qed 'er'er e
Rû-bînçe ye xweş dilber e
Ev Şah Selîmê enwerî

Di helbestê de peyva dawî ya bendê ger di destpêka benda pişt re jî were bikaranîn ew dibe hunera î'adeyê (Kocakaplan, 2011: 50). Di navbera bendên 1 û 2 û 3 û 4an de jî hunera îadeyê heye. Lewra bêje û îfadeya ku bend pê qediyaye dîsa heman bêje an îfade di serê benda peyrew de jî derbas dibe. Di navbera benda yekem û duyem de bi bêjeya “leb”ê û dîsa di navbera benda sêyem û çarem de jî bi bêjeya “çehv”ê ev hunera îadeyê derketiye holê.

Dil ji dest çûye Xuda ra / el meded seyda meded
Wer kerem carek bi ma ra / el meded seyda meded
Seyda 'ê Sanî Şeh Selîm / seyda eman seyda eman
Qutbê zemanî Şeh Selîm / seyda eman seyda eman

Di helbesta sêyem de îbareya “el meded seyda meded” û di helbesta çarem de jî dîsa îfadeya “seyda eman seyda eman” di hemû malikan de tê tekrarkirin û bi vî awayî helbest bi tekraran hatiye bihêzkirin.

Sewdaser im ey çav-xezal / ez pîremerd im pîremerd
Ehsîn îleyye bîl-wisal / seyda eman seyda eman

Di helbestekê de risteyeke an jî niv riste bi zimanekî cuda were nivîsandin ew dibe hunera telmî'ê (Kocakaplan, 2011: 147). Di vê malika jor de jî hem zimanê Kurdî hem jî yê Erebî di heman malikê de derbas dibe û ev yek jî dibe hunera telmî'ê. Dîsa di hin cihên din de jî bi vî awayî îfadeyên Erebî û Farisî hene.

Îro tebîbê mutleq î / xweş şêremerd î şêremerd
Babê Heqî babê Heqî / seyda eman seyda eman

Di metnekê de peyveke ku ji yekê zêdetir maneyên wê hebe û ev peyv ne di maneya ku tê zanîn, lê di maneya herî dûr de bê bikaranîn hunera tewrîyeyê derdixîne holê (Kocakaplan, 2011: 183). Yek ji kurên Şêx Mihemed Selîm jî Îsmail Heqî ye. Di vê malikê de jî hunera tewrîyeyê heye, lewra “Babê Heqî” hem di maneya “derîyê heqîyê” de, hem “Bavê Heqî” û hem jî di maneya “xwedî-edalet” de ye.

2.2.4. Kevneşopî û Giringîya Helbestan

Di ekola Neqşebendîya Xalidîyê de têkilîyeye xurt a murîd û murşîdan heye û li ser pîr û murşîdên terîqetê helbestên bi teşeyên cur bi cur hatine nivîsîn. Helbestkarên ku li derdora tekyayan mezin bûne piraniya wan murebbe' û qesîdeyên medh û şînê nivîsîne. Ev helbestên Mela Ehmed jî minakên vê tradîsyonê ne. Di helbestên wî de jî unsûr û mezmûnên tesewîfî li pêş in û helbest li dora tekyayê hatine hûnandin û ev 5 helbest di kategoriya helbesta terîqî-tekyayî de dikare werin nixandîn.

Helbestên wî aliyê wî yê terîqetê yê di nav ekola Neqşebendîya Xalidîyê de jî nîşan dide û wî jî bi heman kevneşopiyê ve jî bo murşîdê xwe medhiye û mersîye nivîsîne û edîbbûna wî bi van helbestan aşkere bûye.

Tablo 2: Hin Taybetiyên Naverokî yên Helbestên Mela Ehmed.

Helbestkar	Mela Ehmedê Hezanî				
Helbest	Helbesta 1.	Helbesta 2.	Helbesta 3.	Helbesta 4.	Helbesta 5.
Cûreya Nezmê	Mersîye?	Medhiye	Medhiye	Medhiye	Medhiye
Ji Aliyê Naverokê	Şîn û veqetîna li pey wefata Şêx Ziyaedînê Norşînî û murşîdê terîqê.	Medh û pesnê murşîdê xwe Şêx Mihemed Selîmê Hezanî kiriye.	Medh û pesnê murşîdê xwe Şêx Mihemed Selîmê Hezanî kiriye.	Medh û pesnê murşîdê xwe Şêx Mihemed Selîmê Hezanî kiriye.	Medh û pesnê murşîdê xwe Şêx Mihemed Selîmê Hezanî kiriye.
Mijar	Êş û xema li pey şêx û murşîdê terîqê	Medhê murşîdê xwe	Medhê murşîdê xwe	Medhê murşîdê xwe	Medhê murşîdê xwe
Tema	Êş û eziyeta veqetîne	Pesn û hezkirina ji bo murşîdê xwe	Pesn û hezkirina ji bo murşîdê xwe	Pesn û hezkirina ji bo murşîdê xwe	Pesn û hezkirina ji bo murşîdê xwe

Metnên Transkirîbekirî yê Helbestên Mela Ehmed

Destxeta muellif bi xwe nehatiye peydakirin û ev nusxeya di pêvekan de hatiye dayîn bi xetên Mela Ehmed Yalar hatiye nivîsîn. Hin xeteyên ku ji destên mustensîx derketine, hatin tesbîtkirin û sererastkirin. Ji ber ku nusxeya muellif ne li ber dest e dibe ku hin xeteyên mustensîx ên din jî hebin. Ji nusxeya destxet ev helbestên Mela Ehmed (Hemdî) bi elîfbêya transkirîpsiyona navneteweyî hatin nivîsîn. Herweha ligel metnê hin îzah û tesbît jî di jêrenotan de hatine dayîn.

[r.158-160]

Mîn ebyatî ‘emmî ummîne Mela Ehmed raḥîmehullah⁵

-1-

Mefa ‘îlun / Mefa ‘îlun / Mefa ‘îlun / Mefa ‘îlun

1. Xudaya kan xelilê dil / penah û rehnumayê dîn
Siracê mehfel û menzil / şehê ‘alem Zîyaeddîn
2. Şehê ‘alem mehê xawer şedaya erci ‘î bişnîd
Ciḥan zîr û zeber şod ez firaqê şeh Zîyaeddîn
3. Firaq û dehşet û dahî / tenê bo me nebû cana
Sema û erd û tamahî / bi ḥucreş têk(i) berbad î
4. Welê berzex bûye me ‘mûr / bi rûhê wî bûye purnûr
Mela ‘ik cumle bûn mesrûr / tenê em jar û pejmurd î
5. Tenê jar û xerab mal in / çî bedḥal û bi ten dal in
Şubhê goyîn û ‘ebdal in / di kûh û sehlê Ferhad î
6. Di her sehl û di her badî / di her buldanê her badî
Dikin giryan û hey dadî / bi ah û nale mu ‘tad î
7. Ji giryan eşk(i) tîn wek Nîl / di her şam [û] seḥer yaran
Me qibla dil bûye teḥwîl / ‘enakêş [û] esef-xord î
8. Esef ez hicareş emrûz mîxored ‘alemê insî
Kî mewtê ‘alimî çûn wey çû mewtê ‘alem est yek bîn⁶
9. Mişal ‘alem muşewweş bû / bi riḥlet têk(i) serxweş bû
Li me ṭali ‘qewî reş bû / yetîmê pur-xem û der dîn
10. Yetîmê bêqiyem bêkes / emînê⁷ yarê li me xes
Me dîbû ṭali ‘ek pur neḥş / bi talan û bi feryad î

⁵ Ev nişe ya mustensîx Mela Ehmed Yalar e û wî bi Erebi di vir de gotiye: “Ji helbestên apê dayika min Mela Ehmed[ê Hezanî]”.

⁶ Ev îfadeya bi Farisî ku atifeke ji bo hedîsê ye tê maneya: “Mirina alimekî weke mirina alemekê ye”.

⁷ Ev beje baş nehat xwendin û fehmkirin, dibe ku “emînê” an “ehînê” be.

11. Li eytaman qiyem bû ew / di e'waman hekem bû ew
Bi cewher muhteşem bû ew / çû Teyfûr û çû Necmeddîn
12. Çi xweş kibrîtê eþmer bû / bi wî 'alem mu'eþter bû
Heçî wî dî muzeffer bû / di vê silkê dibû temkîn
13. Li ser nehca Muþhemmed bû / bi wî meslek mumeþhed bû
Bi wî erkan muþeyyed bû / mu'in û destegîrê dîn
14. Nefes-Îsî yû qudsî bû / bi wî hey bû dilê murde
Yeçîn ew Quþb û Weysî bû / qesem ba sûre'ê Yasîn
15. Nebû emrûz(i) la wellah / bi mişlê babê Fethullah⁸
Di irşada 'ibadullah / birêje nisbeta rengîn
16. Di nisbet Behrê Umman bû / di hikmet şubhê Nu'man⁹ bû
Der ulfet pîrê Ken'an bû / çû reft Yûsif şod û xemgîn
17. Çû riþlet kir li wî necle / dimû' barî wekî Dicle
Li dû wî ew jî bû neqle / xem û şeb hicranê nûrîn
18. Eman bedra cemal-ara / ela ey dilbera xara
Nebaşed kî wefadared kesî ra in felek xa'in
19. Felek bedbext û seþhar e / çî bê 'ehd e çî mekkar e
Bi kê ra ew dibû yar e / te'erruz kir bi kerb û kîn
20. Çî xa'in e çî bê sebr e / li ser çeþvê me kir xebr e
Li me kir sa'et û hesr e / esîrê bê peder ma'in
21. Esîr in kî teşerruf ke / bi imdadan telettuf ke
Di irşadê teweqquf ke / di her an û zeman û hîn
22. Di vê 'eşrê di vê hînê / ji Şînê ta bi Qezwînê
Nebû wek şahê Norşînê / muceddit ke esasê dîn
23. Meded ke ey mehê Serhed / ji [bo] vî qa'ilê Ehmed
Ew e muflis ew e bêked / ew e naçar û hem miskîn
24. Ew e namerd û miskîn e / 'elîlê jar û xemgîn e
Tebîbê wî di Norşîn e / di te'zî ew bûne teskîn
25. Îlahî wî bike mehfûz / bi alaman nekî mehzûz
Ji bo me her ev e melhûz / selamet bî bibên amîn

⁸ Qesta wî Şêx Fethullahê Werqanîsî (w. 1899) ye.

⁹ Ev şexs Ebû Henîfe ye.

26. Selamet bî Selîmê dil / mudawa ke birînê kul
Ew e min rehberê kamil / ez im gumrah û hem go'în
27. Ez im gumrah û hem kemter / ela ey **Ĥemdiyê** bedter
Ji babê Salîmê¹⁰ enwer / umîdwar û meded-xwah î
[r.160-161]

-2-

Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlatun / Fa'îlun

1. Kewşer û abul-heyat e / cam û fincana Selîm
Melce û fewz û necat e / eywan û dîwana Selîm
2. Fatiĥê qufla qulûban / mexzena esrarê Ĥeq
Serwerê meĥbûb û xûban / têk(i) qurbana Selîm
3. Qible'ê ehlê miradan / Ke'be'ê erbabê 'îşq
Saqiyê teşne fû'adan / can û canana Selîm
4. Rişte'ê rûĥ û rewan e / reh-şinasê taliban
Rahê ĥeq ra ĥeq dizane / rehber û dana Selîm
5. Çi şîrîn 'alî-cenab e / ew çi me' rûfê zeman
Her dike celbê rîqab e / luĥf û îĥsana Selîm
6. Kî di 'ilm û remz û razan / se'yekî meşkûr heyê
Dê binase ew bî asan / qedr û mîzana Selîm
7. Lahî û sahî meborne / bê teleb hem bê edeb
Tu bizane Kûhê Tûr e / xan û derbana Selîm
8. Fexle' înn-ne'le bîqurbîn¹¹ / meş' erel-beytul-ĥebîb¹²
Weşmezîl-'eyne edîben¹³ / pêş(i) damana Selîm
9. Kî bî çavê dil bibîne / qed û balaya şîrîn
Dê muĥeyyer ew bimîne / d' ĥusnê şeyrana Selîm
10. Bû mubeşşir bis-se'adet / ehlê şuĥbet xaş û 'am
Çunkî bûn şaĥîb-muweddet / d' zîll û sîwana Selîm
11. **Ĥemdiyê** xafil tenê maye feqîr û rûsiyah
Lê yeqîn şaĥîb wefa ye zat(i) xaqana Selîm
[r.161-162]

¹⁰ Salim kurekî Şêx Mihemd Selîmê Hezanî ye û qesta wî jî vê Şêx Mihemed Selîm e.

¹¹ Li vê derê jî bo ayeta Ta-ha 12ê telmîh heyê.

¹² Li vê derê şair ibareya “meş' erel-beytul-ĥebîb” jî dîsa di heman cihî de nivîstî ye û ev tê maneya: “Tu nêzî mala hebîbê xwe ye”.

¹³ Ev tê maneya: “Bi edeb çavên xwe bigre”.

-3-

Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilun

1. Dil ji dest çûye Xuda ra / el meded seyda meded
Wer kerem carek bi ma ra / el meded seyda meded
2. Ev dilê qasî yû lahî / der cesed bê çare ye
Hey bike b' hubba Îlahî / el meded seyda meded
3. Tê ji dil ah û enînek / mustexasê min tu î
Nîne wek te nazenînek / el meded seyda meded
4. Nîne wek te kes ji xûban / rûyê to iksîrê 'îşq
Her dikî tuhra qîlûban / el meded seyda meded
5. Renc û derdê 'îşq e xalib / şubhê ateş dem bi dem
Hil dibe der qelbê qalib / el meded seyda meded
6. Ev çi mal e çi menal e / neqdê rûh û can tû î
Qed û balan min xiyal e / el meded seyda meded
7. Bi mezarê kalê bab e / min yemîn ey Şah Selîm
Bê te nîne xwab û tab e / el meded seyda meded
8. Her şev û şehre di şalan / şebê qedr in şehperî
Ger bibînim zulf û xalan / el meded seyda meded
9. Xed û xalê te xuyaye / nîne hewce b' mihr û mah
Rûyê te bedrek zîya ye / el meded seyda meded
10. Rûyê te xurşîd mişal e / çehvê min kor e çi kim
Mektûb lê ismê Celal e / el meded seyda meded
11. El meded ez her dibêjim / ey Zîyaeddîn meded
B' her dû çavan xûn dirêjim / el meded seyda meded
12. Derdimendê bê delîl im / lê tû î her min delîl
Hemdiyê jar û zelîl im / el meded seyda meded
[r.162-163]

-4-

Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun

1. Seyda 'ê Şanî Şeh Selîm / seyda eman seyda eman
Quţbê zemanî Şeh Selîm / seyda eman seyda eman
2. Hem dilruba û dilberî / ez derdimend im derdimend
Şîrîn-leb û leb-şekkerî / seyda eman seyda eman

3. Dermande me ey surperî / ez mustemend im mustemend
Dil-xeste me ey dêmzerî¹⁴ / seyda eman seyda eman
4. Dilbestiyê dama te me¹⁵ / mame di qeyd û qufl û bend
Dil-kuştîyê hûsna te me / seyda eman seyda eman
5. Ey dilruba û xemrevîn / men derkemend im derkemend
Hâlê mi ra têtin girîn / seyda eman seyda eman
6. Şuĥbet rehîqa şafî ye / ez dûrîdest im bê meded
Her keskî nûş kir 'afî ye / seyda eman seyda eman
7. Ey rûhû nûra beserê / na 'eqilmend im 'eqilmend
Carek li min ke nezerê / seyda eman seyda eman
8. Burqe' ji ser sîma bi nûr / ey selw(i) qed ey serw(i) qed
Rake tecellî bête Tûr / seyda eman seyda eman
9. Ey rayeta emn û eman / sîret-lewend qamet-bulend
Ey rehberê her dû cihan / seyda eman seyda eman
10. Sewdaser im ey çav-êzal / ez pîremerd im pîremerd
Eĥsîn îleye bîl-wîşal¹⁶ / seyda eman seyda eman
11. Ey murşîdê nahîl-menah¹⁷ / ez Serĥed û ĥeta bi Hind
Ey qa 'îdê rahê Îlah / seyda eman seyda eman
12. Îro ĥebîbê muĥleq î / xweş şêremerd î şêremerd
Babê Ĥeqî babê Ĥeqî¹⁸ / seyda eman seyda eman
13. Baĥê Zîyaîda gul î / baĥvan bi xwe gul xed û xend
Miĥrab û hem qîbla dil î / seyda eman seyda eman
14. Saqiyê her teşne-leb î / tîh im ji ewwel ta ebed
Ayîne'ê rûz û şeb î / seyda eman seyda eman
15. Nale bi dergeh mîzenend / **Ĥemdî** çû seg seyda meded
Seyda meded seyda meded / seyda eman seyda eman
[r.163-165]

¹⁴ Di navbera parçeyê yekem ê risteya duyem a malika 3yem û parçeyê yekem ê risteya yekem a malika 4em de teq-dîm û texîr pêk hatiye, me ew li gorî karîneyê di bin kontrola mustensîx de sererast kirin. Ji karîneya helbestê hat fehmkirin ku parçeyê yekem ya risteya duyem a malika sêyem û parçeyê yekem ya risteya yekem a malika çarem divê bi hev re bihata guhertin. Ev xetayê teknîkî ya mustensîxî bû û me ew her du parçe bi hev re cî guhertin. Bi vê guhertinê wate û şemaya serwaya navekî jî sererast bû.

¹⁵ Ev parçe û parçeyê malika sêyem cî guhetin û bi vê yekê sererast bû.

¹⁶ Ev tê maneya: "Bi wesleta xwe li min qenciyê bike. An jî wisalê bik para min".

¹⁷ Ev tê maneya: "Murşîdê ku gunehan qedexe dîke".

¹⁸ Yek ji kurên Şêx Mihemed Selîm jî Îsmail Heqî ye.

-5-

Mustef' ilun / Mustef' ilun

1. Îro hebîbek min heye
Şehzade ye hem şeh-perî
Hem dil-hebînek min heye
Durdane ye leb-şekkerî
2. Leb-xunce ye xweş-xeber e
Dêm kewkeb e qed 'er'er e
Rû-bînçe ye xweş dilber e
Ev Şah Selimê enwerî
3. Dildar e dîlcû ye gelek
Şehmar e wî zulfê xelek
Gulnar e wî xûye-melek
Çehvê xumarî dilbirî
4. Çehvê xezalî min xem e
Birhên di dalî qelem e
Le'lên zulalî Zemzem e
Her kes wî dî lê heyirî
5. Dilbir bi nehb û xemzeyek
Axir bi rehb û remzeyek
Sewda kirim wî b' cezbeyek
Rûhê xwe min qurban kirî
6. Ba nehb û xar ba nehb û xar
Tê şehsuwar her car û car
Wî rim di dest esp namidar
Ew pêşrew e der her serî
7. Der se'yû seyra salikan
Wî seyr kirî der her mekan
D' seyra leṭa'if la-mekan
Bo xwe ewî imza kirî
8. D' seyra leṭa'if 'erşî ye
Meşreb bi xwe ew Neqşî ye
Ew ka'in e hem ferşî ye
Nasî ewî nas nekirî
9. Dem qudsî ye enfasê 'Îs
Ew hey dîke qelbê celîs
Ya Reb bikî bo me enîs
Wî der miḥad û meşerî

10. Hêy ke cenan hêy ke cenan
Çû min ji dest ev rûh û can
Ah û eman ah û eman
Qutbê Hezan xweş rehber î
11. Ah û enîn ah û enîn
Ey xwace'ê dunya û dîn
Mam rûreş û xam û kemîn
Hetta bibim rehguzerî
12. Mam xam û çû 'eqlê temîz
Min kir telef 'umrê 'ezîz
Bo min bide xemra lezîz
Da min 'eqil bête serî
13. 'Umrê 'ezîz bûye telef
Ah û esef ah û esef
Carek bi dest cama şedef
Bo min bide ey dêm-zerî
14. Ah û esef tînim gelek
Radkim ji bunyad heft felek
Min şahid e ins¹⁹ û melek
'Alem hemî bo min girî
15. Bil-cumle 'alem man 'ecîb
Pêkve dikin huzn û nehib
Gotin çira miskîn xerîb
Îro qewî ne şabir î
16. Bûme xerîb bûme be'îd
Ez şuhbeta ceddê Hefîd²⁰
Belkî şeqî me ne se'îd
Mechûl e ev dû-xeberî²¹
17. Hêmdî xerîb û qaşi ye
Çendî nehib û 'asi ye
Danî li 'utbê naşi ye
Wek tûle û kelbê derî

¹⁹ Di destxetê de ev bêje weke "ism" hatibû nivîsîn, lê me li gorî karîneyê û di bin kontrola mustensîx de ew weke "ins" sererast kir.

²⁰ Hefîd kurê Îsmail Heqî ye û neviyê Şêx Mihemed Selîm e.

²¹ Li dawîya vê malikê mustensîx ji bo "dû-xeberî" ku li gorî destxeta ber destê xwe jê amin nebûye û îfadeya "le'e-lehû-sewab" nivîsiye.

ENCAM

Mela Ehmedê Hezanî yek ji endamên malbata Mela Ebdilâhê Semerşêxî ye ku ew jî xelîfeyê Mewlana Xalidê Şehrezorî bûye. Ji malbata Semerşêxî gelek alim û edîb derketine û di avakirina gelek medrese û tekyayan de cih girtine ku yek ji wan jî Dergeha Hezanê ye.

Mela Ehmed li derdora Tekyaya Hezanê di çarçoveya murîd û murşîdîyê de helbestên edebî, tesewîfî û terîqî bi Kurdîya Kurmancî nivîsîne. Heta niha di lîteratura de em rastî berhem û helbestên wî nehatibûn.

Mela Ehmed van 5 helbestên xwe li ser Şêx Mihemed Selîmê Hezanî nivîsiye û pesnê wî daye, lêbelê di helbesta di rêza yekem de li ser Şêx Mihemed Ziyaeddînê Norşînî mersîyeyeke ku dîsa di dawîya wê de jî medhê Şêx Mihemed Selîmê Hezanî kiriye.

Ji helbestên Mela Ehmedê Hezanî tê fehmîkirin ku jîyana wî ji aliyê ‘ilm û tesewîfê ve têr û tîje ye. Lewra ew ehlê medreseyê ye û jîyana wî bi ‘ilmê re, di medreseyan de derbas bûye. Ji ber ku ew pêgirekî terîqeta Neqşebendîyê ye ji aliyê têkilîya di navbera murîd û murşîdan de jî jîyaneke tesewîfî borandiye.

Ji van helbestên wî jî tê fehmîkirin ku Mela Ehmed jî weke alim û şairekî heyama xwe tevgerîyaye û di çarçoveya kevneşopîya ekola Neqşebendîya Xalidîyê de helbestên tesewîfî-terîqî nivîsîne. Ji aliyê ziman û edebî ve jî helbestên wî serkeftî û herikbar e. Di helbestên wî de hem unsûrên edebîyata klasîk û hem jî yên çanda kevneşopîya tekyayan xuya dibin.

Mela Ehmed di her 5 helbestên xwe de jî mexlesa “Hemdi” bi kar aniye. Bi van helbestan Mela Ehmed jî weke şair dikeve nav lîteratura Kurdî ku wî jî bi şeweya klasîk helbestên xwe nivîsîne. Ligel vê yekê serdem û şeweya Mele Ehmed jî dikeve nav şeweyê û serdema qonaxa Xalidîyê.

Çar helbestên di rêza ewil de bi malikan e û bi teşeya qesîdeyê û bi cûreyên mersîye û medhiyeyê hatine nivîsîn û di wan de hunera tesmîte heye. Helbesta pêncem jî bi teşeya murebbe‘ê û di cûreya medhiyeyê de hatiye nivîsîn. Şeweya vê murebbe‘ê di nav şeweyên standart de şeweya “Murebbe‘a Muzdewica Digel Benda Yekem a Mutenawib” e. Helbestên Mela Ehmed jî li derdora medrese û Tekyaya Hezanê hatine nivîsîn û bi vî awayî ew jî dikevin bin banê edebîyata tekyayê.

Çavkanî

- Adak, A. (2018). Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de. *Nubihar Akademi*, 3 (10), 11-58.
- Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*. Stenbol: Weşanên Nûbiharê.
- Aslan, M. (2011-Kasım). Ahmet Yalar ile Röportaj. *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*. Sayı: 6, 159-167.
- Çakır, M. S. (2017). Şeyh Abdülkadir-i Hezânî (V. 1908) Ve Hezân Dergâhı'nda Yetişen Sûfî Âlimler. *Mevlânâ Hâlid-i Bağdâdî ve Hâlidîliğin Bingöl ve Çevresi Üzerindeki Etkisi (Ulusal Sempozyum) 04-05 Mayıs 2017 Bingöl*. (r. 353-358). Bingöl: İlkbahar.
- Doskî, T. Î. (2011). *Mela 'Ebdillâhê Hizanî û Şairên Malbata Wî*. Duhok: Weşanên Spirêz.
- Karak, M. Z. (2020). *Dîwançeyaya Şêx İsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)*. Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê. Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê. Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Karak, M. Z. (2021). Qesîdeya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî. *Kurdiyat*, (3) , 41-66.
- Karak, M. Z. (2022). Medhiyeyeke Şêx Şehabeddînê Tîlî. *Kurdiname*, 0 (7), 147-160.
- Karak, M. Z. (2022). Şairîya Şêx Ziyaeddînê Norşînî (Hezret) . *The Journal of Mesopotamian Studies*, 7 (2) , 185-204.
- Kocakaplan, İ. (2011) *Açıklamalı Edebî Sanatlar*. İstanbul: Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları.

M. Zana KARAK

Helbestkarekî Tekyaya Hezanê: Mela Ehmedê Hezanî

Mela Ahmet Yiğit “Tekyaya Hezanê û Mela Ehmedê Hezanî” (Hevpeyvîna Taybet: 25.08.2023).

Mela Ehmed Yalar “Mela Ehmedê Hezanî” (Hevpeyvîna Taybet: 13.11.2020 & 16.07.2023).


Saraç, Y. (2013). *Klâsik Edebiyat Bilgisi; Biçim-Ölçü-Kafiye*. İstanbul: Gökkuşbu Yayınları.


Sultan Erkazan “Mela Ehmedê Hezanî” (Hevpeyvîna Taybet: 08.06.2023).

Yalar, M. E (?). Fotokopîya Nusxeya *Mecmû'eya destxet* (Mustensix: Mela Ehmed Yalar), n.r. 158-165.

PÊVEK

Pêvek 1: Destxeta 5 helbestên Mela Ehmedê Hezanî








109


یتیم بی قیام بجای کسی امین یارگله حسن
مه دیو طالعلک پر نفس بتالان و بفریادین
لایتمانان قیام بو او دعوامان حکم بو او
بجو هر عیشتم بو او چو طیفور و چو نجم الدین
چه خوش کبریت اجر بو بوی عالم مظهر بو
هیج وی دی مظهر بو دق سلاک دبو نمکین
لسر نهجا محمد بو بوی مسلاک مهر تدبو
بوی ارکان مشید بو معین و کنگیر دین
نفس عیسی و قدکی بو پوی حی بودل مرده
یقین او قطب و ویشی بو قس باسوره یاسین
نه بو امر و زلاوالله بمثل باب فتح الله
دارشاد اعباد الله بر بیره نسبتارنگین
د نسبت بحر عثمان بو حکمت شبه نعمان بو
در وقت پیر کنعان بو چورفت یوسف شد او نمکین
چی رحلت کر لوی نجله دموع باری وکی دجله
لدووی اوژی بو نقله غم و شب هجرتن نورین
امان بدر ایمال آرا الا ای دلبر افکارا
نباشد که وفادار کسی را این فلاک خائین
فلاک بدبخت و سخاره چه بی عهده چه مطاره
بکی با او دبو یاره تفرقن کر بکرب و کین


160
چه خائنه چه بی صبره لیسچمه کرغزیه
لمه کرساعة وحسره همیری بی پدرمانین
اسیرن کی قهرق که بامدادان تلافی که
دارشاد توقفا که دهرآن وزمان و حین
دقی عهردتی حین ژصین تابقروین
نه بووک شاه نورشین مجدد که اسکن دین
مدد که ای فیه سجد ژتی قابل احمد
اوه مفلس اوه بی کد اوه ناچار و هم مسکین
اوه نامرد و مسکینه علیل ژار و غمگینه
طیب وی دنورشین دتغزی او بوته تسکین
انهی وی بکه محفوظ بالامان تکی محفوظ
ژبومه هراقه ماکوفا سلامت بی بیین آمین
سلامت بی سلیم دل مذاوا که برین کل
اوه من رهبر کامل ازم گمراه و هم گوئین
ازم گمراه و هم گمراه ای محمدی بدتر
ژباب سالم انور امیدوار و مددخواهین
فلسفه
کوثر و آب الحیانه جام و فحنا سلیم ملجا و فوز و نجات ایوان و دیونا سلیم
فاخ قفلا قلوبان مخزن اسرار حق سرور محبوب و خوبان تیه قریب سلیم
قبله اهل مرادان کهبه ارباب عشق ساقی تشنه فوادان جان و جان سلیم











Pêvek 2: Şecereya Malbata Hezaniyan (Nusxe ya Mela Ehmed Yalar)



Pêvek 3: Xetên Mela Ehmedê Hezanî, ji mecmûeya wî.

